Sîyaseteke weha qirêj, mixabin, di vê demê de tenê li ser kurdan tête meşandin. Ji ber ku hêza herî zêde karîbû rola xwe bilîze, her wiha nexş û pîlanên hêzên navdewletî pêk bîne, kurd bûn. Kurd di şer de jîr in. Kurd di hevalbendî û hevkariyê de rast û dirust in. Kurd di baweriyê de ne dudil in û girêdayî soz û peymanan in.

DAIŞ derket û dewleta Tirkiyê bi rengekî nîvveşartî rêbertiya wê dikir û di heman demê de bang li siyasetmedarên Rojavayê Kurdistanê dikir da ku têkiliyan li gel wan deyne.

Li Başûrê Kurdistanê jî heman tişt; dewletiya Tirkiyê serkêşiya DAIŞê dikir. Wargehên perwerdeyê, çavkaniya pereyan û bazara firotina petrola DAIŞê jî ji hêla Tirkî ve bû. Bi hezaran tirk li bajarên Tirkiyê -bi taybet li Dîlokê- hatin perwerdekirin û ji bo êrîşa li ser kurdan hatine rêkirin. Dema ku DAIŞ kete Mûsilê, balyozxaneya Tirkiyê bi awayekî hesan û hema bi fermî ji aliyê rayedarên Tirkiyê ve radestî DAIŞê hat kirin.

Di demekê de ku tirkên DAIŞî serên ciwanên kurdan jê dikirin, Serokwezîrê Herêma Kurdistanê li gel Tirkiyê di peywendiyeke birayetî ya berdewam de bû.

Îroj jî heman siyaset dimeşe. Erdogan ne mirovekî taybet e ku ji asmanan hatiye, ew jî wekî Dehaqê berî sê hezar sal, zilm û zorê li nav kurdan û li cîhanê belav dike. Na, Erdogan û artêşa xwe jî rasterast li gorî siyaseta Ingilîstan, Ewrûpa û Amerîkayê tevdigerin û îro vê zilmê bi kaşeya wan a "Erê" li ser kurdan dimeşînin. Ji bo ku mirov vê yekê bibîne, pêwîst nake ku mirov siyasetmedar be. Îro welatekî NATO bêyî tu astengî, bêyî tu hişyarî û bêyî tu nerehetiya hêzên navdewletî zarokên kurdan bumbebaran dike û bi rengekî durinde êrîşî gund û deverên Kurdistanê dike.

Çîroka Efrîna dilbirîn bi yek-du rûpel nivîs nayête derbirîn bê guman. Bi yek nivîsê mirov nikare tevayî dîmenê Efrînê binexşîne û pêşan bide. Lê di encamê de eger li ser çareyê mirov çend gotinan bike, ez ê karibim ne bi hizrê siyasetvanekî, ne bi hizrê mirovekî li Efrînê, lê bi hizrê kurdekî ji welatê xwe dûr, lê her kêlî dilê wî bi dûmana nava Efrînê tijî, weha bibêjim:

Ew şaşîtiya kurdan a dîroka wê vedigere 3 hezar sal, ew şaşîtiya ku dixwazin bi serdestên xwe re, bi dijminên xwe re li hev bên û wekî mirovan bijîn, tu carî derfeta serkeftinê nabîne û ji kurdan re nabête çareyek. Ne tirk, ne ereb, ne ecem, di tu defterên wan ên olî û yasayî de cihê kurdan tune. Bo vê yekê jî, hem hêzên serdest û dagirker, hem hêzên navdewletî û emperyal tenê ji hêzê fam dikin û tenê hesabê hêzê dikin. Ji kurdan re jî hêzeke xweparêz, kurdparêz a bêpîvan pêwîst e ku tu sînoran nas neke.

Îro qehreman û palewanên Kurd di zevî û keviyên Efrînê de berxwedaneke bêhempa pêşan didin.

Lê Enqere, mêjî û dilê terorîstan aram e. Stenbola navenda dewleta terorîst, aram e, Izmîra navenda qaşo rewşeniya tirkan aram e.

Agirî Soran

Efrîn tenê bi şerê xwe nayête parastin, li Nisêbîn, Cizîrê û Amedê jî nayête parastin; lê li Enqerê, Izmîr, Stenbol û hemî bajarên Tirkiyê dê bête parastin. Hetanî ku di kezeba dijminan de derbeke kuştdar nekeve, ev dijminên li ser termê kurdan sifreya xwarina xwe radixin dê kumê xwe nedeynin pêş xwe û nehizirin. Bo vê yekê şerekî giştî, li hemî deverên Tirkiyê û welatên derveyî Tirkiyê, li dij Tirkiyê pêwîst e. Ew hêz, ew derfet û ew zanebûna kurdan heye. Eger ev yek nayête kirin, ev qelsiyeke mezin a kurdan e û dê xisareke mezin bide kurdan.

Rêka serkeftina berxwedana Efrînê, di şerê Enqere û Stenbolê re derbas dibe.

Silav ji bo giyanê zar û zêçên di bin agirê bumbeyên hovan de candayî.

Silav ji bo mêrxas û şajinên ku bi dil û laşên pak, erd û erza xwe û ya hemî kurdan diparêzin.

Gotarên ku tên weşandin, nerînên xudanên xwe ne.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Hevseroka Desteya Çand û Hunerê li Kantona Cizîrê: “Ew berhemên ku bi zora rêjîmê li ser refan tozgirtî man, dê bi baweriya me werin çapkirin”

Ji nîvê sedsala 20’ê û bi şûn de, êdî kar û xebata wêjeyî li Rojavayê Kurdistanê bi hemî şêweyan hatibû qedexekirin û hewildanên ku hebûn jî bi awayekî raz û veşartî bûn. Ji sala 2011’ê ve rêjîma Sûriyeyê pencê xwe ji gewriya kurdan kêşa. Hin bi hin seqa û atmosfereke guncaw ji bo berhemdana hemî şêwe û celebên wêje û hunerê peyda bû. Di 2014’ê de Rêveberiya Xweser ava bû û pê re jî Desteya Çand û Hunerê li her sê kantonên Rojavayê Kurdistanê hat avakirin. Ji wê demê ve Desteya Çand û Hunerê li Kantona Cizîrê hejmarek ji çalakî û festîvalên cihêreng li dar xistine. Di vê hevpeyvîna jêrîn de, rewş û dîmenê wêjeyî û çandî li Rojavayê Kurdistanê tê nirxandin, her wiha hin plan û projeyên Desteya Çandê diyar dibin. Piştî avabûna Desteya Çand û Hunerê li Kantona Cizîrê bi 6 mehan, B.Bêrîvan Xalid bû hevseroka desteyê û hêj di xebat û cihê xwe de berdewam e.

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtanî

- Eger bi kurtebirî jî be, lê dixwazim di destpêkê de tu li ser qonaxa avabûna Desteya Çand û Hunerê û pêvajoya wê ji dema avabûnê ve û hetanî îroj biaxivî?

Gava ku di sala 2014’ê de li Cizîra Rojavayê Kurdistanê Rêveberiya Xweseriya Demoqratîk hat ragihandin, wê demê Desteya Çandê jî yek ji desteyên Rêveberiya Xweser bû. Desteya Çandê li ser bingeha Neteweya Demoqratîk hat avakirin, ji lew re ev dest bû dengekî sereke ji Rêveberiya Xweser re. Di sala pêşîn de -wekî hemî dezgeh û desteyên nûavabûyî- Desteya Çandê di milên rêvebirî û sîstematîk de xwe li pêş xist. Her çi qas liv û tevgera desteyê di sala pêşîn de wekî hewildaneke fihêtok jî bû, lê belê piraniya beş û şaxên desteyê hatin damezrandin, her wiha kar û peywir ji hev hatin veqetandin. Belku hetanî aniha jî em ji hêvî û xwestekên civata rewşenbîr û nivîskaran re nebûne bersiv, lê belê di sala duyan de me pêdiviyên xwe nas kirin û êdî me plana kar li pêş xwe danî. Paşê projeya me ya herî stratecîk vekirina Peymangeha Orkêstra bû, da ku zarok bi awayekî akademîk hînî amûrên muzîkê bibe. Her wiha me 8 navendên xwe li bajar û bajarokên Herêma Cizîrê vekirin. Me Komîna Sînema jî ava kir. Me gelek festîval li dar xistin. Ji vê yekê zêdetir jî me yekîtî û hevgirtinên hunermend û jinan jî ava kirin... Dikarim bibêjim ku êdî tecrube û hêçana me çêbûye û em aniha li ser berfirehkirina şax û navendên xwe dixebitin. Ji aliyekî din ve jî em amadekariyên lidarxistina çalakiyên cîhanî dikin.

Êdî em jî li ser bipêşvebirina asta pirtûk û xwendinê –bi taybet a kurdî- dixebitin

- Li Cizîra Rojavayê Kurdistanê, rewşa pirtûkxaneya kurdî çi ye?

Em dikarin bibêjin ku îro rewşa pirtûkê bi giştî tevlihev e û di krîzekê de derbas dibe. Dema ku sala çûyî me pêşangeheke pirtûkan vekir, ew wekî hawarekê bû ji aliyê me ve ku em rewşa xwendinê û rewşa nivîskaran hinekî baştir bikin. Ev krîz û lawaziya ku îro di pirtûkxaneyê de tê dîtin, ji encama wê zor û sitema ku li ser Rojavayê Kurdistanê dihat meşandin e. Êdî em jî li ser bipêşvebirina asta pirtûk û xwendinê –bi taybet a kurdî- dixebitin. Tevlî her tiştî jî lê belê îro baş nivîskarên me hene, her wiha li ser dika şanoyê jî tiştên hêja tên pêşandan... Îro em dizanin ku salane herî kêm du festîvalên wêjeyî tên lidarxistin û gelek nivîskar berhemên xwe di wan festîvalan de pêşkêş dikin, dixwînin; ji vê yekê jî em dikarin bibêjin ku êdî nivîskar encamên berhem û berhemên xwe dibîne.

Ekrê nivîskaran e ku van kêliyên şoreşê belge bikin û di dîrokê de misoger bikin

- Ev pirtûkxane, herî zêde pêwîstiya wê bi kîjan celebê berheman heye; anku di kîjan milî de qels e?

Hemî beş û celeb hevdu temam dikin, lê pêdivî bi nivîsîna lêkolîn, dîrok û romanê heye... Îro li Rojavayê Kurdistanê dastanên berxwedanê tên jiyankirin, eger ev dastan bibin roman û bêne nivîsîn, dê çiqasî baş be? Gelek serhildan û şoreşên kurdan çêbûne, lê hetanî aniha jî tu belge û berhem li ser wan tune ne. Ekrê nivîskaran e ku van kêliyên şoreşê belge bikin û di dîrokê de misoger bikin. Divê ku ev dîrok bê nivîsîn, her timî mayînde bimîne, her û her li xwe zêde bike...

Hêj wijdanê hinan neliviyaye; jixwe nivîskarî wijdan e

- Anku tu dibêjî li beramber giraniya evê şoreş û berxwedanê, hêj tiştekî hêja û bilind nehatiye nivîsîn?

Me gelek caran ev yek nîqaş kiriye, her wiha me rexene kiriye û me ji nivîskarê kurd daxwaz jî kiriye. Carinan nivîskar dibêjin divê ev tişt piştî şoreşê bêne nivîsîn! Di baweriya min de na, divê aniha ev tişt bêne nivîsîn. Divê ev dem û kêlî bi pênûsên zêrîn bêne nivîsîn. Em nikarin bibêjin ku nivîskaran tiştek nekiriye, lê belê hêj wijdanê hinan neliviyaye; jixwe nivîskarî wijdan e. Hewildan hene, lê hêj jî lawazî heye.

- Nivîskarên ku aniha ne li dinê ne, lê belê bi dehên salan li ser daneheva zargotinê û nivîsîna wêjeyê xebitîne, çarenûsa destnivîsên wan çi ye?

Projeyên me ji bo her tiştî hene, bi taybet ji bo çapkirinê. Nemirên di rêya wêjeya kurdî de têkoşîn kirine, ew cihê hurmetê ne û gerek e Desteya Çandê li wan xwedî derkeve. Dîsa jî em dibêjin her tişt li gor derfet û imkanan in. Tiştekî din jî li vir heye: Dema ku me ji bo kesên nemir çap dikir, hin nivîskaran digot ku piştî nivîskarek dimire, em nû xwedî li wan derdikevin û divê em li nivîskarên heyî miqate bin. Îcar dema ku em ji bo yên jîndar jî çap dikin, dibêjin we yên mirî paşguh kirine... Ji bo vê yekê jî divê ku mirov hevsengiyekê çêbike. Lê divê derfetên rojavayî jî hebin; yanî ka çapxane, ka weşanxane? Li ser asta Rojava, tenê du çapxane hene. Ew karîn û jêhat hêj lawaz in. Dema ku derfetên pêwîst peyda bûn, êdî ew berhemên ku bi zora rêjîmê li ser refan tozgirtî man, dê bi baweriya me werin çapkirin.

Pêşangeha Pirtûkan dê wekî hemî çalakiyan, salane hebe

- Di 2017’ê de cara yekê bû ku Desteya Çand û Hunerê li bajarê Qamişlo pêşangeheke pirtûkan li dar xist. Di wê demê de hat ragihandin ku her 3 mehan dê li bajarekî Rojavayê pêşnageha pirtûkan were lidarxistin. Çi projeyên we ji bo evê çalakiyê hene?

Pêşangeha Pirtûkan dê wekî hemî çalakiyan, salane hebe. Salane di 20’ê meha 7’ê de -salvegera şehîdbûna Herekol- dê pêşangeha pirtûkan were lidarxistin. Di salên bê de, piştî ku pêşangeha navendî were lidarxistin, dê her sê mehan li bajarekî din jî şaxên evê pêşangehê werin vekirin.

-Pêşangeha navendî, her sal dê li Qamişloyê be?

Na. Dibe ku sala bê li Hesekê yan jî li Dêrikê be, anku cihekî destnîşankirî ji bo wê tune ye. Lê belê dê her sal a navendî hebe û şaxên wî jî dê hebin.

- Ji bo çapkirina pirtûkekê, Komîteya me ya nirxandina pirtûkan jî heye, ji 5 kesan pêk tê. Dema ku pirtûkek ji bo çapê tê, ew komîte wê pirtûkê dinirxîne. Pirtûkeke ku em çap jî bikin, divê ku binirx û hêja be, yan jî nayê çapkirin.

-Pirtûkeke ku bêyî destûra we bê çapkirin û ne li gor pîvanên we bin, hûn dikarin desteser bikin?

Belê em dikarin. Me hişyariyek li ser hemî çapxaneyan belav kiriye û tê de daye xuyakirin ku pirtûka ku bê çapkirin, divê muhra desteyê li serê hebe.

Heger me par 3 festîval li dar xistin, îsal 9 festîval dê bên lidarxistin

- Ji bo çapkirina pirtûkekê, merc û pîvanên we çi ne?

Me dest bi çapkirina pirtûkan kiribû û pîvanên me jî hebûn. Ne tenê ku deste çap bike, lê çi pirtûka ku bête çapkirin, divê ku Desteya Çandê lê binere. Sê pîvanên me hene:

1-Pirtûka ku bê çapkirin, divê ku Girêbesta Civakî binpê neke.

2-Divê ku bêrûmetiyê li tu ol û çandan neke.

3-Divê ku ne li dij exlaq û rewiştên civakê be.

- Ji bo demên bê, tu planên we hene ku hûn ji aliyê çapkirinê ve hin gavan biavêjin û destekê bidin nivîskaran?

Ez dibêjim ê herî zêde ku derfet ji bo wî alîkar in, nivîskar e. Lê çi jî bê xwestin em careke din amade ne.

Gelek çalakî di plan û projeyên me de hene; yek jê Pirtûkxaneyeke Navendî ye, yek jî li şûna Sînema Amûdê ya şewitî avakirina Holeke Sînemayê ye, yek jî vekirina Parkeke Çandî ye, her wiha avakirina Weşanxaneyekê ye û hwd...

Heger me par 3 festîval li dar xistin, îsal 9 festîval dê bên lidarxistin.

Aniha projeya vekirina kargeheke dirûtina cil û bergên 3 pêkhateyan di rojevê de ye. Her wiha em ê hunergeheke şêwekariyê jî vekin.

- Desteya Çand û Hunerê weku desteyekê ji yên Rêveberiya Xweser, diravdana ku ji Desteya Diravî jê re tê, têra wê dike yan na?

Em salane dirava ku ji me re pêwîst e, destnîşan dikin. Lê tu caran têra me nekiriye û belku bi 3 qatan zêdetir em dikişînin. Desteya Çandê tu dezgeh û navendên wê tune ne ku diravan jê re bînin, yanî tenê em xerc dikin û careke din ji Desteya Diravî dixwazin.

- Di biwara çêkirina branş û materyalên dibistanan de, hevrêziyek di navbera we û Desteya Perwerdeyê de heye?

Hetanî aniha tu hevrêzî tune ye. Lê belê ji îsal û pê ve, em ê komîteyekê ava bikin da ku branşên hunerî yên wekî: muzîk û şêwekariyê bidin dariştin. Ev yek jî wekî pêşniyarekê ye û dibe ku bi cî bibe. Ji ber ku em dixwazin ku waneyên hunerî bi awayekî akademîk bêne dayîn.

- Sipas dikin ji bo dana evê derfetê...

Gelek sipas ji bo we jî. Jixwe çand û ragihandin hevûdin temam dikin. Ragihandin bi xwe jî dikare bibe dengê me ji bo hemî cîhanê. Careke din em soz didin ku dê her û her hewildanên me hebin ku em daxwazên civata rewşenbîr û nivîskaran cî bi cî bikin. Hêvîdar in ku em bibin bersiva xwestekên vê demê.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Rewşenbîr Jî Şaş Dihizirin

Raman Seydo

Dîrok dirêj e, roj tarî ye û rê li pêşîya wêjevan û torevanê kurd winda ye. Çawa ku zevî, çîya, zozan û çem bindest in, wisa helbest û wêje jî bindest in. Zêdetir ji du hezar sal di ser hilweşîna Şahinşahiya Mîdî re derbas dibin. Bi sedên salan in ku Kurdistan di bin dagirkeriya sitemkar û zordaran de dijî. Armanca sereke ya hemû zordaran qedexekirina ziman bû, lê ew armanc bi cî nehat û di demekê de ku bi sedên zimanan mirin, zimanê kurdî heta roja îro zindî ma.

Bê guman bi saya helbest, dastan, sitran û dengbêjan zimanê kurdî hate parastin. Jixwe kurdan ji helbestên ku rewşa Kurdistanê tanîn ziman, hez dikirin .

Lê di dîroka nû de, hin rewşenbîrên kurd, rê şaş kirin .

Îro li gelek cihan -bi taybet li semîner û şevbuhêrkan- ji aliyê hin helbestvan û nivîskaran ve hevokek tê gotin; ew jî ku: “Pirtûkxaneya wêjeya kurdî û ya erebî yek e.”

Berî ku cudahîya di navbera helbestvan û helbesta erebî, helbestvan û helbesta kurdî de bidim xuyakirin, dixwazim bi kurtî li wan kesan vegerînim :

Ez benî, zimanê kurdî ji malbata zimanên hindo-ewropî ye. Ew kesên ku pê diaxivîn, ji wan re “korgans” digotin (4300.B.Z). Di pê re navê wan bûye “arî”.

Zimanê erebî ji malbata “samî” ye. Zimanên erebî, ibrî û birek ji zimanên din, reha wan yek e.

Li ser vê rastîya dîrokî, dikarim bibêjim ku wêjeya kurdî û ya erebî heta bi reha wan jî ne yek e.

Belê sê tişt hene ku ji gotina hevoka navborî re dibin sedem, ew jî ev in:

1- Yan ew kes di zimanî xwe de qels in û ber bi zimanekî din ve direvin.

2- Yan ew bi xwe ne nivîskar in û xwe di pişt ristên nedîyar de vedişêrin

3- Yan jî ev ciwanmêr bi çavê “Selîm Berekat “ li xwe dinerin.

Di bawerîya min de dê tu rewşenbîr nekeve van şaşîyan, ji ber ku berî niha min da xuyakirin ku pirtûkxaneya herdu zimanan nabe yek .

Tenê bandora ola islamî hinekî hebû, lê ew beşekî din e û nayê wateya ku wêje bibin birayên hev; ji ber ku bandora zimanan û derbasbûna gotinan tiştekî normal e, ne şerm e.

Dîroka Helbesta Erebî û Hin Helbestvanên Wê:

- Sûq El-Ukaz: Di Serdema Cahilî de bazarek bû. Helbestvan li wir dicivîyan û helbest dixwendin, da ku pereyan qezenc bikin .

- Imri’u El-Qeys: Mezintirîn helbestvanê ereban e. Diçû ser çemê ku jinan serê xwe tê de dişûşt û li ser laşê wan helbest dihûna. Malikeke wî ya navdar heye, dibêje: “Heta bi jina ducanî dilê xwe dibijîne min.”

- El-Ihûteya: Yek ji helbestvanên navdar ên ereban e ku di helbestên xwe de xeberên pîs ji xelkê re didan; heta ji bav, dê û hevjîna xwe re jî didan .

- Nabîxa El-Zibyanî: Evî jî konek vegirtibû û di bin de bi helbestvanên din re bi poçan li hev dixistin .

- El-Mutenebî: Ew jî ji navdarên helbestvanên ereban e, digot: “Ez pêximber im “. Bi sedema hûnandina helbestekê, hat kuştin, ev jî malikeke wê helbestê ye: “ Şûr û şev û biyaban min dinasin.” Dema ku çend siwarên rêbir ketin pêşîya wî, revîya. Xulamê wî jê re got: Ma ne te digot: “ Şûr û şev û biyaban min dinasin.” Ji ber vê gotinê di cihê xwe de sekinî, rêbir gihanê û ew kuştin.

- Serdema Ebasîyan: Dîroka helbesta erebî di Serdema Ebasiyan de gelekî xerab bû .Helbestvan diçûn ber lingên mîrê ebasî û helbestên xwe ji bo pereyan dixwendin, tev de kurtêlxur bûn… Naxwazim pir dirêj bikim, ji ber ku dîroka helbesta erebî tev wisa ye. Di vir de ez ne şerê wan dikim, belê dixwazim ku cudahîya di navbera helbestvanê kurd û yê ereb de bidim xuyakirin.

Dîroka Helbesta Kurdî û Hin Helbestvanên Wê:

-Baba Tahirê Hemedanî: Helbestên xwe li ser êş û vîna jîyanê dihûnan.

-Melayê Cizîrî: Serdarê evîndaran e. Helbestên xwe li ser vîn û hezkirina Xweda û welat dihûnan. Ew bîr û ramanên wî yên zêrîn, di dîwana wî de xweş xuya ne .

-Ehmedê Xanî: Tenê ji ber dastana ku li ser evîna Mem û Zînê nivîsiye, hêja ye ku mirov bibe aşiqê hestên wî .

Bi hezaran helbestvanên kurd bi vî rengî nivîsîne û hetanî îroj dinivîsin.

Hêjayî gotinê ye ku hemû helbestvanên kurd xebatkar bûn, gelek ji wan diçûn şoreşê û di çeperên şer de radiketin. Pir ji wan nêvîyê jiyana xwe di zindanan de derbas dikirin û gelek ji wan di zindanan de ji ber lêdanê şehîd dibûn, bi taybet li ser dema serokê berê yê Iraqê Sedam Hisên. Her wiha dîwanên wan jî dihatin şewitandin. Heta aniha jî li Rojhilata Kurdistanê rewş wiha ye.

Mîr û serokan pere didan helbestvanên ereb, di heman demê de jehir didan helbestvanên kurd; mîna bavê dastana kurdî Ehmedê Xanî.

Pirs xwe dubare dike: Gelo ka bi çi rengî helbest û wêjeya kurdî û erebî yek e!!?

Nivîsên ku tên weşandin, nerînên xudanên xwe ne.

Avesta...Vejîna Medan li Efrînê ye

Sultan Temo

Eger em li ser dîroka bav û kalên kurdan lêhûrbîniyekê bikin, em ê baş baş û zelal bibînin ku dema herî zêrîn û bihêz, a serdema konfederaliya Medya ye. Ji medan û vir ve her çiqasî gelê kurd di demên cihê de mîrnişîn û xanedan ava kiribin jî, lê tu carî mîna Medya fireh, zengîn û bi wate nebûne. Li Mezopotamyayê Imperatoriya Aşûr sembola zulm, zor û sîtemkariyê bû; ewê imperatoriyê vîna gelên med, pers û babiliyan çewisandibû, pir sîtemkar û xwînxwer bû. Di wê serdemê de medan pêşengtiya serhildan û raperîna li hember kedxwarî û dagirkeriyê kiribû. Ewê serhildanê hêza xwe ji mîratê Diyako yê rêxistinî û ji felsefeya Zeradeşt a aşîtîxwaz û azadîxwaz digirt, her wiha xwe dispart biratiya gelên pers û babilan.

Her çi qas ev konfederaliya med, pers û babilan bi serbaziya medan jî be, lê gelên din ên Mezopotamyayê sûd jê girtin û ji sîtemkariya Impertoriya Aşûr azad bûn. Gelên Medya bi hişmendiya felsefeya Zeradeşt a durist û rasteqîn nêzî gelên hevpar ên axa Medya dibûn, lê belê herdu gelên din bi heman hişmendiyê nêz nedibûn; bi taybet persan xap û lîstok rîstin, ji bo hilweşandin konfederaliya Medyayê.

Dîrok tu carî xwe dubare nake, lê belê gelek caran dîrok di pêvajoyên wekhev re derbas dibe. Ji ber vê yekê bê çawa naverok û cewherê felsefeya Zeradeşt di pirtûka pîroz a Avesta de bû sedema azadiya gelên Medya, îro jî şehîda rûmetê Avesta xabûr bi hişmendiya jina azad û bi hişmendiya aşîtî û biratiya gelan, li hember hovîtiya toraniya osmaniyên nûjen û sextekariya pêxwasên çolan, bi biryar, fedekarî û lehengî bû sembola serhildan û azadiya jinê û gelên bindest.

Di roja îro de dewleta Tirk (osmaniyên nûjen) di laşê Rojhilata Navîn de nexweşiya penceşêrê ye; vîn û azadiya gelên kurd û ereb nas nake, bi hemû rengên kedxwarî, bêbextî, zor û çewisandinê êrîşî nimûneya jiyana hevbeş, aşîtîxwaz û azadîxwaz a gelan dike. Li Efrînê weke çawa berî wê li Koban û Serê Kaniyê, aniha berxwadana ronahî li hember tariyê, berxwedana azadî û biratiyê li hember binestî û faşîzmê li dar e. Carekê di dîrokê de li Medya felsefeya Zeradeşt bi pirtûka Avestayê azadî ji bav û kalên kurdan re anî û bû destpêka rojeke nû “Newroz”, roja xweşî û buhara gelan li Mezopotamyayê. Îro dîsa li ser heman xakê, li ser xaka sembola aşîtiyê “dara zeytûnê” li Efrînê; zarokên agir û rojê, hilgir û parêzvanên felsefeya Zeradeşt bi biryar û qehremaniya Avestayan li hember olperestên hov û şovenîzma netewperestî û paşverûtiyê li ber xwe didin. Bi xwîna xwe ya zelal û pîroz mîna tîrêjên rojê, rêka azadî û serkeftinê ji gelên mezopotamya re xêz dikin û soza rojeke nû, Newrozeke nû, jiyaneke azad û pêşerojeke şahnaz dane.

Bê guman çawa li Medya azadî, aşîtî û biratiya gelan di sîwana felsefeya Zeradeşt de bi ser keft, îro bi sedhezaran Avesta û Barîn li ser heman şop û hişmendiyê dê ji gelên me re serkeftin û azadiyê û ji bindestî û kedxwariyê re mirinê bînin.

Giringiya Teknolojyayê di Warê Hînkirin û Perwerdeyê de

Şiyar Silêman

Hînkirin: Prosesa veguhestina agahî û zanyariyan di navbera kesê hînker û kesê ku dixwaze hîn bibe de ye.

Veguhestina agahiyan di qonaxên dîrokê de gelek ezmûn û serbor derbas kirine. Eger ne ji veguhestinê bûya, dê gelek zanyarî di demekê de rawestiyana û dê civakên pey wan nikarîbûna sûdê ji wan zanyariyan wergirin; anku hebûn û nebûna wan zanyariyan dibû wek hev.

Asta serkeftina seyda û mamoste bi şêwazê veguhestina wî ji zanyariyan re tê destnîşankirin. Heger ew karibe bala xwendekar bikişîne û bihêle şêweyê hînkirinê têkeve dilê wî, dê ew zanyarî mejiyê wî jî ronî bikin, lê heger kesê hînker nikaribe bihêle xwendekar ji zanyariyan hez bike, dê nikaribe bandora xwe ya hînkirinê wek tê xwestin lê bike.

Her serdemeke dîrokê şêweyekî wî yê pêşketîtir ji serdemên berî xwe di warê hînkirin û veguhestina agahiyan de heye. Ji ber pirbûna zanyariyan di serdemên nûjen de, nema şêwe û prosesên kevneşop têra veguhestina wan dikin, lewra welatên pêşketî rojane şêwazên nû di warê hînkirinê de diafirînin, da asta nifşên xwe li gor nûjenî û pêşketina cîhanê bilind bikin û afirandinê li rex wan bi pêş de bibin, da ku ayindeyeke geş ji welatên xwe re dabîn bikin.

Ji ber van pêdawîstiyan têrma “Teknolojya Hînkirinê” xwe daye pêş û bûye sîsika jiyanê ji hemî gelên cîhanê yên pêşketinxwaz re.

Mirovahiyê di sedê bîst û yekê de, yê ku em niha tê de dijîn, gavine pir mezin di warê hînkirinê de avêtine, ew jî bi sûdewergirtina ji pêşketina teknolojyayê, û pêkhatîbûna mamosteyan di bikaranîna wê teknolojyayê de bûye fakterê sereke ji bo afirandina şêwazên nû yên fêrkirinê û danîna têkiliyan bi xwendekaran re, ji ber nifşê nû her dem dixwaze li gor şert û mercên serdema xwe ya nûjen û wek hevçaxên xwe yên welatên pêşketî tevbigere .

Tevlî ku teknolojya ketiye hemî movikên jiyana nûjen, lê weltên paşdemayî hîn nikarîne sûdê jê wergirin û jiyana xwe pê bi pêş de bibin.

Em wek gelê kurd îro hewcedartirîn milet in di warê bikaranîna teknolojyayê de, bi teybetî di warê perwede û hînkirinê de; ji ber ku bindestiya sedên salan hiştiye em di gelek waran de li paş bimînin û zimanê xwe wek nasnameya netewî di warê hînkirinê de ji dest bidin. Lewra em ji hemî miletên cîhanê hewcedartirên teknolojya ne ji bo em karibin xwe bigihînin karwanê gelên serdest.

Lê mixabin hîn dezgehên me yên ku hene guh nadin vî warî û xwendekarên me li ser şaopa berê û bi alavên kevnar hîn dibin, pirê caran ew jî peyda nabin, ji ber rewşa çewisandin û bindestiyê.

Ji ber van sedeman ji hemî xwendevan, pispor û zanayên kurd tê xwestin ku di pêşkêşkirina pisporiya xwe de nemerdiyê nekin, bi alavên teknolojya yên pêşketî yên bi rengekî ji rengan li ber destê her kesî peyda dibin.

Wek nimûne: Em kurd di warê bikaranîna teknolojya de di hînkirin û hînbûna zimanê kurdî de pir li paş in. Tevlî peydabûna alavên medya û ragihandinê û amûr û malperên peywendiya civakî, lê me nikariye vê derfetê li gor ku tê xwestin bi kar bînin, ji bo pêşdebirin û belavkirina çanda zimanekî kurdî yî mukum, dewlemend û yekbûyî ku bibe bingeha nasnameya me ya hevbeş.

Dema em li ser tora enternêtê lêgerînekê dikin, ji bo hînbûna çi zimanê cîhanê, em bi hezarên fayl, parçevîdyo û programan dibînin, lê dema em li jêderekî ji bo hînbûna zimanê kurdî digerin, em ti çavkaniyên berkeftî ji bo em palê bidin ser û zimanê xwe yê dayîkê pê pêş de bibin nabînin.

Lewra îro civaka kurdî hewcedara dezgehên profîşonal, pîşeyî û pispor e, ji bo yekirina karînan bi armanca pêşxistina di hemî waran de, nemaze di warê hînkirin, fêrbûn û perwerdeyê de.

Civaka kurdî di gelek waran de xwedan kesayetiyên pispor û zana ye, lê ji ber pêknehatîbûna wan kesan di warê bikaranîna teknolojyayê de, sûde ji pisporiya wan wek ku tê xwestin nayê wergirtin û ew karînên wan ên giranbuha gelek caran veşartî dimînin û nakevin gencîneya pêşxistina civakê de.

Di heman demê de, kesin hene xwe di warê teknolojyayê de bi pêş xistine, lê pisporî û zanebûna wan di warên pîşeyî yên din de kêm e. Lewra ew teknolojya jî nakeve cihê xwe yê ku jê tê xwestin de, ji ber nebûna dezgeh û saziyên ku wan karînan bikin yek û berhemên tekûz û pêşketî biafirînin.

Ji ber sedemên me li jor gotin , ji desthilatdarên kurd tê xwestin ku dezgehên pêşketî û serdemî di hemî warên jiyanê de ava bikin, û sûdê ji teknolojyayê wergirin ji bo bersivdana hewcedariyên civakê û peydakirina bingeha pêşketinê, da gelê me jî di nav gelên pêşketî de cihê xwe bibîne.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî...Mehmûd Badilî

Pêl

Pêsîr im
Li ser sînga deryayê
Tilîyên bahozê
Bi min dilîzin
Digernijim.
Lingê xwe radidim
Nav rihinê peravê
Digermijim,
gur dibim.
Di guhê zinaran de
Stirana lehîyê dirêsim
û. . .
Çîroka Keştîya Nûh
Jiber zimanê Cûdî digirim
Ji zarokan re dixwînim.

Bombe

Li vê derê...
li wir,
Ji dûr,
ji nêzîk
Dema bombeyek diteqe
Hezarên bombeyan ...
Di kûrbûna dilê min de
diteqin
Bêdengîya giyan kirêt dikin.
Wiha …
Narîna dûmanê
Disûrike damarê aso,
Jiyan
Girî û jan vedirşe
Dilerizim
Li ber pêlên xwelîyê
Bêhna asîdê difûre
Şilêr diponije
Kurm û kêz
Kişweran ava dikin
Di hinavê daran de.
Zemîn
Di taya darbesta xwe de
Neqilîskan dihejmêre.
Tajanê bahozê
Li her alîyan
Dêmê berbangê maç dike,
û dengê bombeyan
Di guhê min deye
Gêj dibim,
Digevcilim . . .
Çawa şîrava xwêdana me
dibe
bombe
Û
bi me de
diteqe.

Dar

Bi rehên te: dara min,
min aso çand
li her deverê
pê re stûna xewnên xwe,
li ser devê rêyan
min kevir kirin bendewar.
Bi pelên te: dara min,
min şilfîya ba veşart
wiha ...
di xewna
bayekî kesk de me
bejna rojên xwe
pê girêdim.

Bandeva hêvîyê

Xwedê bi çarpêya diçe
di çavê "Meryemê" de
û ez...
Mîna pêxemberekî xaçkirî
Hîn serxweşê
Wê maça bi tenê me
Dema em pêrgî hev bûn
di himêza sîya darê de.
Tav paldayî bû
Li ser bandeva hêvîyên me,
Bêhna me peywan dikir.
Sirûş hildiperikî sînga aso
Girêz bi devê asîman diket,
Ewr ji hev vedikişiyan,
Li navkutka xwe
Dilukumîn.
Qîrîna zarokên penaber
Li kolanên xwedê,
Li dora me
Çerefîtk didan.
Dengê gulfiroşekî dihat
Pê re firefira nava dilê
"Argîlan"
Veciniqî maç
Veciniqî xewn
Ser lêvê taweşîyê.
-Fermo ke…
ev gul ji bo teye
-Du gulên sor bide min
-Tu bi tenê yî !?
-Na..ez li hêvîya çana hêvîyê
me
nuha qîsara evîna me ê lê bide
-Xwedê bi we re be
-Xwedê me nabîne
û dema ku me dibîne
xwe vedişêre
di kincê moranê de.
Erê gulfiroşo
Yara min
Qeşeng e
Lewra cîhan bi tevayî,
Tev Xwedê ..!
Serxweşê
Hilma wê ne
Û ez
wendayê
navê wê me.

Sîng

1

Sînga xwe berde,
Berde ji wan berbendikan
Kêlîkê tenê berde
Ta ku destê bayê azadîyê
û çiçikên te
bi hev re bilîzin.

2

Sînga xwe berde,
De bera pinpinîk
Li asoya wan bifirin
û zarokên rewal
Ser bêhna wan
Razên û şiyar bin.
Kêlîkê tenê berde
Ta ku stêrkên rengenaz
Tev pakrewanê avdarê
Di bin sîbera wan de bilîsin.

3

Sînga xwe berde,



Berde ji nermbayê sipîdeyê re
Ji xewek şêrîn re
Ji stiranek naz re
Aso tî ye: Xanima min
û bahoza çaxê dev jihev e
Ê ta kengî?
Em ê bi kurkê şevê
Kulên dilê xwe binuxumînin.

4

Sînga xwe berde,
Kezeba ewran dişewite
Qitikên beyaran derbeder in
Li her warî...
Li wêranê dil
Hîn nêcîrvanê xewnan
Xefkê jarîyê vedidin
Û şîlaqa çavê xwelîyê dirêsin.

5

Sînga xwe berde,
Bera kelkela pêsîrên eşqê
Tîrêjan bipejilînin
Liyanên dilînîyê
Li qeşaya her canî
Bihêwirin.

6

Sînga xwe berde,
Çi li gundan
Çi li bajaran
Li her kuçeyên gerdûnê.
Dibe
ku ronahî biherike
Lêvên tarîtîyê
Bi sîya xwe ve
Daliqin.
Dîwarên eşkencîyê
Perçe perçe biherifin.
Çirîskên çiçikan
Ji toza awirên riziyayî
Bên vemaliştin.
Çirîskên sibehî
hûr...hûr
Dawerivin paxila bendewarîyê.
Li ser
Stiranek
Xweş
Vehêsin.

7

Sînga xwe berde,
Berde dilê kolanan
Kolanên me
Xemgîn in
Xopanê bajaran
Kêfa xwe
Bi kar tînin.
Kolanên jar
û (. . . . . .),
Qirêja
Pêlavan
Dialêsin.

Zemîn

Çiqasî tu dilovan î
Qeşengîya me
Bêhna axa te ye
Çiqasî tu mehder e.
Em
Mêjokê pêsîrên te ne.
Erê zemîn…
Wiha
Em pê li rûmeta te dikin
Tu jî,
Binê lingên me
Maç dikî...!!

Tewşîya Çaxê

Çem,
Nerxê çaxê dinasî,
Loma her kêlîkê
Zirav… zirav
Fireh... fireh
Ji serî ta binî
Xwe diguhere.
Tîrêjên ronahîyê
Nimêj dikin
Ji hêza tavê re.
Heyv ji çelengîya xwe
Hez dike,
Em jî koletîyê dikin
Ji pendên ku rist bûne
Li rûçikên dema berê.
Deryaya azarên xwe,
Bi kopalê koran qam dikin.
Em ji xwe,
Ji hev bazdidin
Pêlavên qetiyayî dihejmêrin
Tev kêlên bênav
Li ser girê zêr û paxiran.
Gelek caran
Sipîbûn tevleşî
Can û laşê me dibe,
Ne me dirêse
Ne carekê
Em wê dirêsin.
Hêrsa me ji çoga xwe dinale,
Dema em xwe hildigirin
Buxçik dirûxe
Dîs,
Em vedigerin paş.
Kaş,
Gewdê me dike palgeh
wiha...
Sermestî dilîze
Di kezeba pêkên me de.
Li herrîya şevan diçerixin
Li pey mêyîtîya rewrewkê
dibezin.
Kêra demê
Ser stûyê berbangê
Û katjimêr
Qevda dest gez dike,
Pêçî
Dirapelikin movikên ba,
Mij regezên laş dorpêç dike,
Rojnameya dardakirî
Bi dîwarê bêdengîyê ve
Dikuxe..
Dipeke..
Hildiweşe,
Kaxez
Kaxez
Jimar bi jimar
Roj li pey rojê
Di himêza jarîyê de
Diqijqije
Ji bîr dibe.
Hêsirê pendan digindirin
Ser dêmê heymanê.
Baweşkên çilapekên baranê
Enîya sipîdeyê radimûsin.
Şevnem hildipişke
Gulîyên genim
Tev kulîlkên kundir
Dipelmişin.

Newal sînga xwe vedike
Ji koma zixuran re
Zixur bela dibin
Dipengizin çavê tarîyê.
Rojname sergêj e,
Xulik serxweş e bi xulikê
Di sînga hûrdemê de,
Zemberek destê xwe
Dirêj dike navrana wê,
Buxçeya me dilewlije.
Dîs bobelat
Dîs dilêşî...
Sûrikî hinavê hiziran.
Serdem
Bi kindira bayê bertavan ve
Xwe dadiliqîne.
Û tewşî
Hîn hilperkê
Kedî dike,
Ji bîrî jî
Di dilê me de
Nalîse...
Nalîse.

Axa Rengenaz

1

Eya axa rengenaz,
Bo me
Te asîmanek bilind nekir,
Birûsk û tav
Jê neweşand,
Baranek bêreng
Ji mijankê ewran
Li dêmê jarîya me
Nebarand,
Te rêka kadizê
Lê wêne nekir,
Te ne stêrek
Ji toza awirên me
Lê nexişand.

2

Eya axa germijandî
Bo me,
Te zemînek neafirand,
Xêzên sînoran
Lê rast nekir,
Nexşeya welatekî
Li ser nejenand.

3

Eya axa dilovan…
Bo me,
Te welatek ava nekir,
Ne yeksanî
Lê neherifand.
Te birçîyek bi rê nekir
Yan rêwîyek,
Daxwaza wî nelorand.
Te dilek kedî nekir,
Ne canek, ne kezebek
Hêvîyek cî bi cî nekir,
Derûna me
Nexemiland.

4

Eya axa sar û zuha
Bo me,
Ji agirê Newroza me
Te gerdûnek neçirisand
Te asîmanek nemeyand
Bexçakî keskesor
Lê neçizirand
Xwedanekî dadmend
Lê bi cî nekir
Ku jê re bibe peywan.
Te agirek lê daneda
Newroza me,
Te şa nekir.
Lê te dikarîbû
Xewna dûşîze bi dar ve kiriba
Notika giyanê me
Te qurmiçand.

Derd û êşên welat
Nahêlin
Carekê bi te re rûnim.
Û dizîyên pîroz
Ku heşkere
Li bajarên me dibin,
Terr û hişk tevlaş kirin.
Û bi kêrên talanê
Kezeba berbangê
Diqelêşin.
Qamîşên keskesor
Ji kokê ve
Dibirrin û diqurmiçînin.
Mixabin lê lê,
Ev tiştên ku dibin
Nahêlin
Carekê te biramûsim
Di himêza arê hezkirina xwe De
Te vejînim,
Û di himêza te de
Bipelçiqim
Sermest bimînim.
Belku em bibin canek
Her gavê
Vê xewnê dibînim.
Dîs nexeyide,
Ez ê toza
Vî canê şeyda û jar
Li rûçikên welatê xwe
Biweşînim
Biweşînim
Biweşînim.

Helbestvan Mehmûd Badilî di sala 1973'yê de li gundewarê Dirbêsiya Rojavayê Kurdistanê ji dayîk bûye.

Qonaxên xwendina xwe ya destpêkê li dibistanên deverê diqedîne, paşê li Şama paytext derbasî Kulêja Perwerdehî dibe û lîsans û dîploma xwe li wir disitîne.

Mehmûd Badilî di temenekî biçûk de dest bi nivîsîna helbestê kiriye. Hêj di destpêka qonaxên xwendinê de bû, biryara hilgirtina pênûsê da û hetanî îroj berdewam e.
Ne tenê ji milên hunerî û teknîkî ve, lê belê ji aliyê tablo û wêneyan jî ve nûjeniyekê li helbesta xwe bar dike. Bi vê yekê reng û çêjeke xwe ya taybet afirandiye.

Mehmûd Badilê xudanê du dîwanên helbestan e û bi dehan ji gotarên kurdî û erebî di rojname û kovaran de weşandine.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kultûrname

DILQÊ MEDRESEYA KURDÎ DI VÊJEYA KURDÎ DE 2

Zeynulabidîn Zinar

Vê saziya Medresê, şaxên xwe li her bajarekî, hema bêje li her gundekî vekiribûn û xwendin tê de dihate domandin. Ew xwendin ji sawiya dibistanê heta zanîngehê bûye.

Hin ji wan medreseyan pirî ku menşûr bûbûn, bihêsanî navên xwe di rûpelên mêjû de jî bi cih kirine. Wek Medresa Sitrabasê (Diyarbekir), Merdera Sor (Cizîra Botan), Medresa Bazîdê, Medresa Şemdîzan, Medreseyên Bedlîsê wek Îxlasiye, Katibiye, Şukriye, Şerefiye û Şemsiyeyê. Medresa Hîzanê, Medresa Miksê, Medresa Bêdarê, Medresa Findika Botan, Medresa Axtepeyê, Medresa Norşênê, Medresa Oxînê, Medresa Qerekoyê, Medresa Çûxreşiyê, Medresa Farqînê, Medresa Hawêlê, Medresa Sêrtê, Medresa Heskîfê, Medresa Amêdiyê, Medresa Paloyê û bi sedan medreseyên wisa yên din...

Di wan medreseyan de ji xwendina bi zimanê kurdî, erebî û hinek jî zimanê farisî zêdetir, felsefeya Yûnanî jî tê de dihate xwendin.

Di Medreseyên kurdî de çend şaxên zanistiyê yên cuda dihatin xwendin, wek mênak:

1- Serf û Nehwa Erebî.
2- Tefsîra Quranê.
3- Hedîsa Pêxember.
4- Ilmê Mentiqê.
5- Edeba Behsê (uslûba axaftinê).
6- Ilmê Xweşbêjîyê (waz û nesîhet).
7- Ilmê Belaxetê (ragîhandin).
8- Ilmê Kelamê.
9- Ilmê Hikmetê.
10- Ilmê Qanûnê.
11- Ilmê Feraizê (hiqûqa mîratê).
12- Ilmê Wehdaniyetê (Eqîde).
13- Ilmê Usûlê.
14- Ilmê Heyetê (astronomî û astrolojî).
15- Ilmê Tendurustiyê.
16- Ilmê Hesabê (matematik).
17- Ilmê Felsefê.
18- Ilmê Siyasetê.
19- Ilmê Leşsaxiyê.

Pirtûkên ku di medreseyan de dihatin xwendin, bi tîpên erebî dibûn. Tê de li dora100î, pirtûk dihatin xwendin. Lê nivîskarên piraniya wan pirtûkên bi zimanê erebî ku di medreseyên kurdî de dihatin xwendin, Kurd bûne. Ev rastî jî eşkere ye ku hewesa mele û feqiyên Kurd, zêde ji pirtûkên ku nivîskarên wan Ereb bûn re çênedibû. Hinek ji wan pirtûkên ku dihatin xwendin jî, bi zimanê kurdî û çend pirtûk jî bi zimanê farisî bûn.

Ew pirtûkên bi zimanê erebî ku bi dersîtî di Medreseyên Kurdî de dihatin xwendin, hemû wergera wan ji aliyê dersdarî ve bi zimanê kurdî bo şagirdan dihate kirin. Ev hawe jî dibû sedem ku zimanê kurdî berepêş here.

Kurdan ji kesê/a dersdar re “seyda” digot. Di zimanê kurdî de peyvika ”sey” navê dersê ye, daçeka ”da”yê jî, jixwe wateya dan/dayînê ye ango ders dide.

KARÎKATÊR

Kurdî Xweş e

Sêwîxane	ميتم	Rewangeh	مرصد
Xewxane	فندق	Nûnergeh	ممثلية
Masîgir	صياد السمك	Şande	وفد
Kewgir	صياد الحجل	Şandî	مبعوث
Balyozxane	سفارة	Segvan	قناص
Qunsilxane	قنصلية	Kilît	مفتاح

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1							■		■
2		■			■				■
3				■		■	■		
4		■	■				■		
5		■		■	■			■	■
6	■				■	■		■	
7	■			■			■		
8		■			■	■			■
9			■			■			■

Sitûnî

1- Kesê jiyandar, bi can – Cînavkeke xwerû ya pirjimar
2- Mezel, xurfe – Rengek
3- Bavikên kurdan ên ku Medya ava kirin – Alav
4- Ebîr belavkirî – Hilkef vajî
5- Benê zirav ê ku dirûtin pê tê kirin – Birina tiştekî bê ku tu kes pê hay bibe
6- Dijwateya sitand – Zabş belavkirî
7- Birayê bavê mirov vajî – Bajarekî Bakurê Kurdistanê
8- Maddeya ku di berika tivingê de ye – Du tîpên wekhev û di nava herduyan de tîpa r
9- Dar û qirşikên ku dikevin tenûrê – Veqetandeka pirjimar, qertafeke pevgirêdanê

ASOYÎ

1- Kesê merd, destvekirî – Hewa
2- Meheke salê – Serjimêr
3- Dijwateya dît – Maddeya ku nan jê çêdibe
4- Cûryekî firindeyan – Du tîpên wekhev
5- Serbest, ji azad – Nebaş, xerab
6- Meha ku xelk tê de rojê digirin
7- Dijwateya rabûn
8- Evîndara Cak – Agir
9- Cînavkeke tewandî ya pirjimar – Kesê ku bîr dibe

PÊKENOK

Xortek hebû navê wî Simê bû. Simê xwedî jin û komek kuflet, lê belê pir hejar û feqîr bû. Simê dikir û nedikir yeka wî nedibû dido, gihabû baweriyekê ku şensê wî kor e û tu caran bext pê re nabe alîkar. Tevlî evê hejariyê jî, Simê birûmet bû û tu caran xêr û zika ji destên tu kesî nedigirt. Birayekî Simê hebû navê Miho bû. Miho pir dewlemend bû û xelkê ew bi gazindan şewitandibû ku çima alîkariyê bi birayê xwe re nake. Ewî jî dikir û nedikir, Simê pere ji destan nedigirt û xwe kêm nedikir. Mihoyê dewlemend dît ku çare nîne û Simê pereyan ji dest nagire. Îcar şevekê ji şevan Miho rahişt 100 hezar L.S û avêt ber deriyê mala Simê; da ku Simo bi bayê meşê re pereyan bibîne û bêxe berîka xwe. Simo ji malê derket û ber bi cihê ku pere lê avêtî ne ve çû. Berî ku Simo bigihe pereyan bi 10 gavan, di ber xwe de got: “Yaw ma ev kesên kor û bêçav, çawa dijîn? Hema bi Xwedê ez ê çend gavan çavên xwe bigirim û bimeşim, da zanibim kesên kor çawa dikin...” Simoyê belengaz û şenskor çavên xwe girtin û nola koran meşiya, di ser pereyan re meşiya û çawa pere derbas kirin, êdî çavên xwe vekirin...

Simoyê Bêşens

Bernameya Newroza Bakurê Kurdistanê Hat Ragihandin

Partiyên kurdî yên Bakurê Kurdistanê bi daxuyaniyeke hevbeş bernameya pîrozkirina Newrozê eşker kir û tê de ragihandin ku dê ji 17’ê mehê hetanî 21’ê mehê li temamî deverên Bakurê Kurdistanê Newroz were pîrozkirin.

Li jêr diruşma “Faşîzm dê têk here, gel bi ser bikevin” dê 17’ê mehê Newroz li Farqînê were pîrozkirin û wisa bikişîne hetanî ku 21’ê mehê li Amedê were pîrozkirin.

Salane di meha adarê de, partî û rêxistinên kurdî yên Bakurê Kurdistanê bi rêya daxuyaniyên hevbeş, cih û navendên kombûnên Newrozê destnîşan dikin.

Gotinên Pêşiyan

-Agir girtibû mala derewînan, kesî bawer nedikir

-Darê ji binî ve nebir

-Ba li dîwarê derve dixe

-Dê dibistana zarokan e

-Feqîr bi halê feqîran dizanin

-Heçî neke naxwe

-Her xwenda nabe mela

-Keda helal şêrîn e

-Sed gotin bi gotinekê disekine

-Hevalê rêwiyan nan e

Peyva Windayî

Da ku tu peyva windayî bibînî, van navan bi awayekî sitûnî xêz bike:

AGAHÎ – MAMOSTE – ARAS – KOR – BEYANDÛR – BA – GUND – DEKBAZ – BABELÎK – ZÛ – NA – SOZDAR – CAN – PÎROZMEND – ZANÎN – PIRRENG – BENDEWAR – JÊBIR – DOZ

Peyva windayî ji 5 tîpan pêk tê, ew jî navê bajarekî Rojavayê Kurdistanê ye.

J	Ê	B	I	R	■	A	R	A	S
B	E	N	D	E	W	R	K	O	R
B	E	Y	N	D	Û	R	■	B	A
D	E	K	B	A	Z	G	U	N	D
■	P	Î	R	O	Z	M	E	N	D
B	A	B	E	L	Î	S	K	N	A
S	O	Z	D	A	R	■	C	A	N
A	G	A	H	Î	Z	A	N	Î	N
P	I	R	R	E	N	G	D	O	Z
M	A	M	O	S	T	E	R	Z	Û

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	C	I	N	D	Ê	R	I	S	■
2	I	■	A	A	■	R	I	M	■
3	W	A	N	■	M	■	■	Î	Î
4	A	A	■	T	E	W	R	A	T
5	N	■	K	Î	■	E	M	■	■
6	■	S	O	R	■	■	A	S	R
7	J	A	R	■	M	E	■	A	A
8	Î	R	A	N	■	E	G	R	M
9	R	A	Z	A	N	■	G	A	■